



Tevgera Rojhelatê Kurdistanê û rewşa dawî ya rêjîma Îranê

»»» R:5



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (338)21-11-2018 Buha (1000) Tûmen

Rejîma Îranê bêy hevkarîya terorîstan naheve



Brian H. Hook nûnerê taybetî ê Wezaretê Karê Derve a Amerîkayê bo karûbarên Îranê di axaftina xwe ya herî nû de derheq Îranê, tevî îşarekirina bi dorpêçên welatê xwe li ser Komara Îslamî ragehand: **Dorpêçên herî nû ên dîrokî li dijî Komara Îslamî a Îranê hatine cîbicîkirin, û ew pêvajoya jî berdewam dike.**

“Brian H. Hook” di hevdiîtineke televîzyonî de digel kanala “El-hure” ragehandiye:

Dorpêçan çalakiyên rejîma Îranê rastî kêşeyan kiriye. %80 ji dahata Îranê ji riya hinartina neftê ve tê dabînkirin, û me kariye

ku 1 milyon bermîlî nefta hinartekirî ya Îranê kêmbikin, ku dike derdora 2 milyar Dolarî.

Di doma axaftina xwe de jî got: Komara Îslamî di sala 2013`an de nêzî 16 milyar Dolar perê xelkê Îranê li Îraq, Sûriye, û Yemenê bo piştevanî ji terorîzmê, berhevanîna mûşekan, û têkdana ewlehiya navçê xerc dikir, ku wisa bû dorpêçên me jîrane û di cihê xwe de bûn.

Navbirî gotiye: Ev dorpêçane, dorpêçên herî giran in ku me xistine ser rejîma Îranê, û me ew kar wekî beşek ji zextên aborî bi armanca guherîna ref-

tara rejimê dest pê kiriye.

Di gotûbêjeke din de jî digel kanala El-erebiye, “Brian H. Hook” ragehandiye: Îran piştevanê herî mezin ê terorîzmê ye di cihanê de, lewra em zortirîn zextê dixin ser Komara Îslamî, û emê van zext û givaşan bidomînin jî, bi vê cudahiyê ku hekî di derbazbûyî de, dikarin dorpêçên me dewr lê bidin, lê niha bi sedema mîkanîzmên nû ve, nikarin vî karî encam bidin.

Amerîkayê ragehandiye ku bazerganîkirina digel Îranê dikare bi wataya dabînkirina malî ya terorîzmê be, lewra her kes û aliyek hevkarîya Îranê



**PDKÎ û neh aliyên din ên siyasî
“levtêgihîştinname”yeke hevpar
îmza kirin**

»»» R:3



Ji înkare ve ber bi qebûlkirinê

»»» R:2



bike, dikeve bezineya dorpêçên me de. Ji aliyekî din ve jî “Mike Pompeo” Wezîrê Karê Derve ê Amerîkayê rû li Xamineyî ragehandiye:

Perê Îraniyan ji xelkê xelkê Îranê re xerc bike. Li dijkiyara bi dorpêça li ser şandina nefta Îranê bo Sûriyê, Wezîrê Derve ê Amerîkayê hişdariya dubare da hemû aliyekî, û rû li Xamineyî jî peyamek belav kir.

“Mike Pompeo” Wezîrê Karê Derve ê Amerîkayê jî paş ragehandina nûçeya dorpêçkirina neh kes û navendan ji aliyê welatê xwe ve bi tohmata veguhastina neftê bo Sûriyê, rû li Xamineyî ragehand: Bedela xerckirina perê xelkê Îranê bo terorîstan, xelkê birçî ê welatê xwe têr ke. Her di doma vê peyama “twitter”î ya xwe de ragehandiye ku rêberê Komara Îslamiya Îranê dibe biryara xwe ya dawiyê bide, ku gelo ew girîngiyê dide jiyana xelkê Îranê, yan jî girîngiyê dide alîkariya maddî bo terorîstan?!

Sergotar**Ji înkare ve ber
bi qebûlkirinê****N: Kerîm Perwîzî**

Kêşeya serekî ya Rojhilata Navîn û welatekî belalêdayî wekî Îranê aliyê kêr di heyama sedsala borî de, ev bû ku dadperweriya siyasî ku bi yek çavî li hemû neteweyên vê herêmê binêre, di gorê de nebûye.

Nebûna dadperweriya siyasî, yan bi gotineke din hebûna stemeke siyasî li ser neteweyên cûrbicûr di navçeyê de, çavkaniya serhildana dehan û sedan kêşeyên cûrbicûr di navçeyê de bûye, û dawiya sedsala 19'an, û hemû sedsala 20'î û destpêka sedsala 21'an teji kiriye ji qirkirin û înkare û hewla cînosyada ên din! Ji kuştara Ermenîyan û kuştara Kurdan li Bakur û Rojhilat ve bigre heya karesatên piştî biryara cîhada Xomênî û enfal û tawanên li dijî Şengal û qirkirina Yehûdîyan di vê navçeyê de, û kuştara Şî'eyan di vî welatî de, û cînosayda Sunîyan di vî welatî de, û dehan û sedan mînakên din ku her hemû jî ji bîrokeya hevdu helandin û înkare ve çavkanî girtiye, û Dr. Qasimloyê nemir gotiye ku terorîzm jî vê bêdadiyê di Rojhilata Navîn ve çavkanî girtiye, û heya ku dadperwerî û pêkvejiyana wekhev ya neteweyan dabîn nebe, terorîzm hişk nabe.

Di Îranê de jî, bitaybetîtir diyarde û bîrokeya înkare û helandinê hatiye teorîzekirin û piştî deshîlata Rezaxan teorî bi hêza çek û potî hatine piraktîzekirin, û qirkirin û cînosayd bûye encama wê.

Di vê Îrana wêran û kavil de, zêdetir ji sedsalekê ye ku teorîya şovenîstî hebûna neteweya cuda di Îranê de înkare bikin, û hemû hewleke teorîk û nîzamî û aborî û îtila'atî û emniyetî û ... hwd hatiye dan, ku hemû xelkê nav erdnîgariya Îranê, wekî yek netewe û wekhev pêname bikin, û bi cîhana derve nîşan bidin û hekî cudahiya biçûk! hebe, eva di hûrdeçand û cudahiya cilûberg û

“Bazên Zagros”ê encama operasiyona xwe ragehand

Girûpa bi navê “Bazên Zagros”ê di nûçeyekê de belav kir ku di encama operasiyona roja Înê de, çend kes hatibûn kuştin û birîndarkirin.

“Bazên Zagros”ê di malpera xwe de belav kir, ku “Pola Arbaba” ya ser bi wan, piştî vê ku taqmek ji kirêgirtiyên talançî û rêgir ên ser bi rejîma Komara Îslamî a Îranê li devera “Xêlereş” a Bane, dane ber êrîşên xwe, çend kes ji hêzên ser bi rejîma Îranê hatibûn kuştin û birîndarkirin.

Pêka malpera “Bazên Zagros”ê û zanyariyên wan derheq encama vê operasyonê, “Arman Fexrî” hatibû kuştin û “Luqman Xeyalî” û keseke din bi navê “Menêşlû” birîndar bibû, û bo nexweşxaneyê “Selahedîn” hatibûn veguhestin.

Şeva 25 li ser 26'ê Xezelwera 1397'an, “Bazên Zagros”ê êrîş kirne ser rêgir û talançiyên rejîma Îranê, ku bi armanca talankirinê û kuştina kasibkarên devera “Nawbirîkan a Xêlereşa Bane” xwe ber wan vedabûn.

“Bazên Zagros”ê ragehand ku heya bidawînan bi deshîlata bizorî ya rejîma Tehranê li Kurdistanê, emê piştevan û parêzerê hevvelatîyên zorlêkirî bin, û bê mandîbûn û bê rewestiyan emê cezaya serkutkerên Rejîma Komara

şahî û kêfxweşiyê de nîşan bidin!.

Erk û wezîfeya bingeîn ya xebata wekhevî-waziya neteweyî di Rojhilata Navîn û bi taybetî di Îranê de ew e ku biselîmînî ku neteweya yekdest di Îranê de tune, û cihek wekî Îranê welatekî çend neteweyî ye, ku ew yek hatiye selimandin û qebûlkirin, û wê demê ye ku maf û daxwazkarî û mafê diyarîkirina çarenûsa wekhev jî dibe, û qebûlkirina rastiya heyî, tehmula encama wê jî çê bike.

Deh rêxiraw ku pêk tên ji çend hizben ser bi neteweyên cuda di Îranê de û çend girûpên din ku xelkê xeyrî neteweyên belengaz û kesên Fars jî têde hene, levtêgihîştinek ragehandine, û min jêve ye, di heyama çil salên borî de, yekem car e ku bi awayekî fermî û ragehandî, ji aliyê girûpên xeyrîneteweyên bindest ve, çend netewebûna Îranê tê qebûlkirin.

Di vê levtêgihîştinê de bi zelalî bas ji yekîtiya azadane ya neteweyên Fars, Kurd, Tirk, Belûç, Erebi û Tirkemenan hatiye kirin. Ku eva bo yekem car e di dîroka nêzîk ya Îranê de, ew yek hatiye qebûlkirin, ku di Îranê de neteweya Îranê tune, belku xelkê Îranê ne ku ji çend neteweyên cuda û wekhev bi navê Fars, Tirk, Kurd, Erebi, û Tirkemen pêk tên.

Ew qebûlkirin û îtirafpêkirin dibe rastiyeke ku dibe nuqteguherîneke dîrokî ku qebûlkirina hevdu wekî pêkhate û nasnameya cuda û wekhev, siberoj û derkewteteyeke gellek cudatir ji ya niha li pey tê.



PDKÎ û neh aliyên din ên siyasî “levtêgihîştinname”yeke hevpar îmza kirin



Deh hizb û aliyê siyasî ên Îranî tevî îmzakirina “levtêgihîştinname”yeke hevpar, daxwaz ji partî û tevgerên din kirin da ku bona sernixûniya rejîma Îranê bi wan re alîkar bin.

Di naweroka bangewaza van hizb û tevgeran tevî îşarekirina bi pêşneya xebata xelkê welat li dijî rejîma Îranê û hewcehiya yekîtiya tevgerên siyasî di vê rastayê de hatiye: Em pêdagir in li ser hewcehiya yekîtiya berfireh bo cihgirkirina demokrasî, komarî û federalîzmê di Îranê de, û herwisa pêdagir in li ser nixwên wekî rewadarî, piloralîzm, cudahiya dîn ji dewlet li ser bingeha belavoka mafê mirovan û pêkvejiyana hemû aliyan û baweriyên siyasî-demokratîk.

Deqa vê bangewazê û “levtêgihîştinname”ya hevpar bi vî rengî ye:

Vexwandina bo hevkarîya hevpar

Welatê me eva nêzî 40 salan e ku di bin zulm û zordarî û deshilatdariya Komara Îslamî de ye. Îrorojê di rewşekê de ku xelkê Îranê di hemû biyavan de, dest kiriye bi xebateke berfireh bona azadî, rizgarî, û bidestxistina mafên xwe, wekî tevger, sazî û partiyên siyasî bi ramanên civakî û pêşneya siyasî a curbicur çalakiyeke hevpar li ser bingeha “levtêgihîştinname”ya xwarê me dest pê kiriye. Em vê hereketa destpêkî wekî pêngavekê dihesibînin ji bona pêkanîna yekîtiyeke berfireh, û di vê riyê de, em ji tu hewlekê xemsariyê nakin. Em li ser hewcehiya yekîtiyeke berfireh bona cihgirkirina demokrasî, komarî, û federalîzm di Îranê de, û nixwên wekî rewadarî, piloralîzm, cudahiya dîn ji dewletê li ser bingeha belavoka mafê mirovan, û pêkvejiyana hemû alî û baweriyên siyasî-demokratîk pêdagir in.

Em tevî pêdagiriya micid li ser berdewamî û berfirehkirina tevgerên nerazîbûnê, medenî, û demokratîk di Îranê de û piştevaniya ji xebata xelkê, hemû partî, navend, sazî û aliyên komarîxwaz ên demokrat ku xwe nêzî “levtêgihîştinname”yê dibînin, vedixwînin bo hevkarî û hevpên-

gaviya ji bo xebata bo hiloşîna Komara Îslamî.

Bingehên hevpar ên alîkariya me

Destpêk:

A: Piştî sedsalekê xebata pîrr evraz û nişîv di rîya azadî û dadperweriya civakî, cihgîrbûna deshilatdariya xelkî, cihgîrbûn û biyasayîkirina demokrasîyê di welat de, û hewla berdewam bona bingehdanîna Îraneke azad, pêşkevî û modern û bi dûr ji her cure ferq û cudahiya regezî, neteweyî û mesebî, welatê Îranê hertim êxsîrê serberedayîti, û hikûmeta dîktator e. Xelk bêpar in ji mafên xwe yê bingehîn, ji azadiyên siyasî, civakî, pîşeyî, û ewlehiya yasayî û civakî.

Ferq û cudahiya li dijî jinan ku nîva nifûsa welat pêk tîne, siyaseta fermî û yasayî ya Komara Îslamî ya Îranê ye. Cudabîr, rewşenhezir, nivîskar, hunermend, zana, ciwan, û xwendekar rastî gefxwarin û êrîşa hertimî ya hikûmetê ne. Kedkar û mamosta, zanîngehî, û berhemhînerên dîn ên serweta madî û me`inewî ya civakê, xwediyê hewcehiyên herî kêr jî nînin, û bêpar in ji mafê

pêkanîna sendîka û pêkhatayên serbixwe.

Ferq û cudahîdanîn û stema neteweyî li dijî neteweyên akindiyê Îranê bi awayên herî tundûtîj dom heye. Komara Îslamî ya Îranê di doma serkulkariyên borî herwisa bi awayekî tundûtîj bersiva daxwazên heq ên neteweyî û qewmî didin.

Yasaya Bingehîn ya Komara Îslamî û pêkhatiya deshilatê, li ser bingeha ferq û cudahîdanîn, tîkiliya dîn û dewletê, dijminatîya digel azadî û nûxwaziyê hatiye avakirin. Di Komara Îslamiya Îranê de xelk bêpar in ji mafê deshilatdariya bi ser çarenûsa xwe de, û mafê mirovan berdewam û bi awayekî tundûtîj tê bînpêkirin.

Rejîma Îranê di tewahiya xwe de derfet nehêlaye bo xweguhartinê, û di çarçoveya wê de, tu yek ji xwestekên demokratîk ên xelkê Îranê ser nagire.

Ku wisa bû sernixûniya Rejîma Komara Îslamiya Îranê, û hiloşandina hemû navendên qezayî, yasadânîn, û birêveberî ên serkulkat (çi siyasî, leşkerî,

»»» Dom R:4

»»» Doma R:3

emniyetî, û ...hwd) û hîloşandina yasaya bîngehîn a Komara Îslamî û yasayên din ên nedemokratîk, şert û mercê destpêkê û serekî di biyavê cihgîrkirina sistemeke komarî li ser bîngeha demokrasî, cudahiya din ji delwetê û mafê mirovan e.

B: Xebata li dijî Komara Îslamî ji destpêka avakirinê ve her-tim hebûye. Dehan hezar kes ji xebatkarên riya azadiyê û dadperweriya civakî di doma nêzî 40 salên borî de, di dema şerê li dijî serberedayîtiya deshilatdar de jiyana xwe ji dest dane.

Çar dehik e, ku xelk bi awayên curbicur nerazîbûna xwe ji rewşa heyî nîşan didin, û bi bêy baldan bi siyaseta serkutkarane ya hikûmetê, bi awayê milyonî daketineser kolanan, da ku bêzariya xwe ji siyaseta nedemokratîk û nedadperwerane û pirr ji ferq û cudahîdanîn ragehînin. Mînaka dawiyê ya wan, tevgerên curbicur ên van mehên dawiyê û bi taybetî, rabûna meha Befranbarê û girev û xwenîşandanên van dawiyane ye. Di encama van nerazîbûnan de, rûçikê Komara Îslamî di asteke berfireh de hate eşkerekirin, û ew berxwedana xelkî hevkarîyeke baş bi hevbendîya neteweyî û navneteweyî re kiriye bona ku bigihîje demokrasîyê.

C: Di doma çar dehikên borî de, azadîxwaz û hêzên çep, demokrat û komarîxwaz bi bernamê û şeweyên curbicur li dijî hikûmeta Komara Îslamî xebat kirine. Lê tecrubeyê nîşan daye ku bi bêy hevkarî û yekîtiya piraktîkî ya van hêzan, îmkana bandordanîna wan li ser guherînkariyên siyasî û pêkanîna alternatîveke demokrat û komarîxwaz bîzemet û dijwar e. Îro bona pêşkevîtiya tevgerê, hewcehiya hevkarî û yekîtiya bikiyar ya van hêzan zêdetir ji her demeke din, bûye pîrseke heyatî.

Em sazî û hizbên înzakerê vê levtegihiştinnameyê, bi bernamê û nerînên civakî û pêşîneya siyasî ya curbicur ku li ser hewcehiya berfireh ya komarîxwazên demokrat, bona bicihkirina demokrasîyê di Îranê de, li ser bîngeha belavoka cîhanî ya mafê mirovan û beşên din ên girêdayî bi vê belavokê, û nîrxên wekî

Çar dehik e, ku xelk bi awayên curbicur nerazîbûna

xwe ji rewşa heyî nîşan didin, û bi bêy baldan bi siyaseta serkutkarane ya hikûmetê, bi awayê milyonî daketineser kolanan, da ku bêzariya xwe ji siyaseta nedemokratîk û nedadperwerane û pirr ji ferq û cudahîdanîn ragehînin

rewatî, piloralîzm, cudahiya dîn ji dewletê, û pêkvejiyana hemû alî û baweriyên siyasî -demokratîk, pêbend in.

Em wekî hêzên ku di riya berde-wamî, berfirehkirin û bihêziya tevgera nerazîbûnê ya xelkê Îranê, ku rengîn kevanek e ji çîn, girûpên civakî, û hêzên siyasî ên azadîxwaz ên civakê, xebatê dikin, û em li ser xebata medenî, û demokratîk û aştîxwazane ku nîşana xisleta tevgera nerazîbûnê ye pêdagiriyê dikin, ku em jihevtegihiştina li ser vî pirojeya destpêkî wekî pêngavekê di bi-yavê yekîtiya berfireh ya komarîxwazên Îranê dizanin.

Pirojeya hevpar ya me

1-Cihgîrkirina sistemeke demokratîk bi awayê Komariya parlemanî li ser bîngeha cudahiya dîn ji dewletê, Cudakirina her sê dezgehan û piloralîzma siyasî, hîlbijartîbûna hemû navendên deshilatê bi dengê rasterast ê xelkê û berçavgirtina esla “tenawib” a deshilatê.

2-Welatê Îranê ser`erdeke e ku di encama pêkvejiyana neteweyên Fars, Tirk, Kurd, Erebi, Belûç, Tirkemen û komên zimanên din û kêmaniyên mesebî û çandî pêk hatiye.

Bona yekîtiya berde-wam û pêkvemana xelkê Îranê hewce ye:

Yekem-Nasname û mafê neteweyî-demokratî a vî xelkî bê qebûlîkirin, û mafê diyarîkirina qedera wan bi fermî bê naskirin. Duyem-Kombûna hêz û naven-dxwaziya niha, cihê xwe bide naven-dîtî û parvebûna deshilatê di pêkhatiya siyasî ya Îranê de. Em daxwaza yekîtiya azadane ya xelkê Îranê di nav sistemeke siyasî û îdarî ya federal de ne.

3-Cudahiya dîn ji dewletê û ga-

rantîkirina azadiya bawerî û ol û meseb.

4-Bicihanîna azadiyên siyasî, mafên demokratîk û medenî ê xelkê, garantîkirina azadiya ramanê, azadiya ragehandinan û zanyarîgehandinê, şeweya jiyanê, çalakiya partiyên siyasî, azadiya birêvebirina civînan, xwenîşandanan, girevan û pêkanîna pêkhatiyên pîşeyî û medenî.

5-Bicihanîna wekhev ya mafê hevvelatiyan, îca ji tu regez, meseb, yan girêdayî tu qewm, netewe, ziman yan rêbazekê be.

6-Pêbendbûn û desteberbûn û garantiya maf û azadiyên ku di daxuyaniya cîhanî ya mafê mirovan û peymanên girêdayî wê.

7-Rakirina cezaya îdamê, û her cure cezayekê ku heysiyet, û pêgeh û mezinahiya mirovan lekedar bike.

8-Dana mafê wehev bi jin û mêran, rakirina hercure ferq û cudahiya regezî, cîbicîkirina tewaw ya naweroka konwansiyona nehêştina cudahiyan li dijî jinan, û garantîkirina yasayî bona pêkanîna û cîbicîkirina îmkanatên hewce bona vegeşîna şîyanên jinan di hemû biyavên jiyana kesî, malbatî, civakî û siyasî de.

9-Bihêzkirina stûnên demokrasîyê di welat de, û berde-wamiya pêkvejiyana dîrokî wisa dixwaze ku mafê wekhev ya neteweyên Îranê û mafê neteweyî-demokratî ya neteweyan û qewmên akincî ê Îrana yekparçe, demokratîk û naven-dxwazî di biyavên neteweyî, siyasî, aborî û civakî bê cîbicî û garantîkirin.

10-Pêkanîna derfetên wekhev bona destpêregihîştina hemîyan bi Avahiyan, Tendirustî, Perwerde, Kar û Şîxul, çand û Bîmeyên Civakî.

11-Pêkanîna pêwendiyên siyasî

ên Îranê digel hemû welatan li ser bîngeha rêzgirtina hember, qebûlîkirina esla heqê hakimiyeta xelkê Îranê, berjewendîya neteweyî û parastina aştiya cîhanî. Em li dijî destêwerdana hêzên derve di nava karûbarên pêwendîdar bi mafê diyarîkirina çarenûsê bo xelkê Îranê û çêkirina bedîlekê ji aliyê wan ve ne.

12-Bikaranîna piştewaniya raya giştî û piştewaniya navendên navneteweyî ji xebata xelkê Îranê bona cihgîrkirina demokrasîyê di welat de, û sepandina zexta li ser Komara Îslamî di warê bînpêkirina mafê mirovan di Îranê de, û bona hevbendîya digel xebata azadîxwazane ya xelkê Îranê.

13-Dijberîy digel binajoxwazî, û bikaranîna tundûtîjî û terorîzmê.

14-Em birêvebirina civînan, girevgirtin, rêpîvîn û formên curbicur ên xebatê, hebûna mafê xweparastinê di hemberî kiryarên tundûtîjî ên hikûmetê û xebata medenî bona gihîştina bi daxwazên aborî û siyasî wekî beşek ji mafên bîngehîn ên hevvelatiyan dizanîn.

Yekîtiya Demokratîk a Azerbaycanê-Bîrlîk

Tevgera Komarîxwazên Demokrat û Layîk ên Îranê Hizba Tezamin a Demokratîk a Ehwazê

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Hizba Demokrat a Kurdistanê

Hizba Komele li Kurdistanê Îranê

Hizba Xelkê Belûçistanê

Saziya Yekîtiya Fedaiyên Xelq a Îranê

Şoraya Muweqet ya Sosyalîstên Çep ên Îranê

Komeleya Zehmetkêşan a Kurdistanê

25.08.1397
16.11.2018

Riya tîkiliyê:

info@iranetehad.org

Tevgera Rojhelatê Kurdistanê û rewşa dawî ya rêjîma Îranê



Mihemedsalih Qadirî

Di germe germa şerê DAIŞ`ê li Iraq û Sûriyê da me dît Îdareya Emerîka ya bi serokatiya Obama bi welatên hevalbend ra ku bi “5+1” tîn naskirin, bi rêjîma Îranê ra derheqî qedexekirina çekirina çekên nûklerî lihev kirin û li hember da Emerîka û Ewropa ew ambargoyên aborî ku berê liser Îranê danîbûn, hilanîn û me dît bi vê yekê êdî rê li pêşiya Îranê vebû ku bikare bi wan îmkân û derfetên jê re çêbûn, çî li qada navnetewî û çî jî li qada herêmî û navxweyî da hewlên xwe bihêzîkirinê bide û bi xasmanî jî bo xwederbaskirin jî nerizayetiye xelkê û tengasiyên hundir dest bi girtin û kuştina dijberên xwe kir û jîngehek bi temamî polîsî û emniyetî bi ser xelkê da hakim kir.

Li demek weha de mixabin me didît ne civata navnetewî û ne jî Emerîka û Ewropa bi sedema şerê bi DAIŞ`ê re û hem jî bi sedema rêkeftina nûklerî bi Îranê ra, li hember wan cinayetên rêjîma Îranê siyaseta bîdengiyê hebûn, lewma ew yek bo Îranê derfet û îmkânên mezin çêkir ku hem li navxwe da û hem jî li Rojhelata Navîn da bikare îstiqrar û balansa siyasî, aborî û emniyetî tîk bide.

Li rewşek wesa aloz û tevlîhev da, em wek PDK-Îranê li ast berpirsaiyeyek mezin da bûn ku li hember siyaseta qirrkirina rêjîma Îranê li dijî gelê Kurd li Rojhelatê Kurdistanê û jî bo xwedî derketin jî îradeya netewî û nîştmanî dest bi xebatek nû bikin.

Li Newroza 2016an de, li ser vê zerûreta han PDKÎ mizgîniya destpêkirina qonaxek nû li xebatê da gelê Rojhelatê Kurdistanê û bang ji xortên welatperwer kir jî bo berevanî jî mafên gel û rizgariya netewî jî dest rêjîma dagîrker ya Îranê, werin rêza xebatê.



Ji wê demê ve êdî hewcedariya teorîzekirî û merîfetsazî jî bo wê qonaxa xebatê ku gotara berxwedana Netewî û Nîştmanî bîngeh bigire, hat esas girtin û êdî ew qonax bi “Rabîn/ Rasan a Rojhelat” hate binav kirin û li gor armanca lihev girêdana xebata “Çiya û Bajar” bi hemû rehendên xebata rewşa li hember dagîrkarî û dîktatoriya Îranê kete ware cîbecîbûnê. Ji wê demê ve em dibînin serbarî pîlanên dujmin û zehmetiyên heyî, lê bi pêşwaziya gel û cangoriya endamên PDKÎ û çalakiyên Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê li piraniya herêm û bajarên Rojhelatê Kurdistanê tê domandin û serbarî şehîdbûna gelek qehremanên Pêşmerge û endamên PDKÎ û girtin û darvekirina xortên me, wê hereketa nû kariye hêviyek mezin bo xelkê Kurdistanê çêke û roj bi rojê ew hereket berfirehtir dibe.

Bi sedan xortên şoreşger jî bo rizgariya welat tîn nav refên Hêza Pêşmergeyê Kurdistanê û mil bi milê xebata Pêşmergeyan, gel jî li nav bajaran xwe bi rêxistin dîkin û zemîna jî bo serhildan û hereketên nerazîbûna cemawerî pêk tînin.

PDKÎ jî bo ku Rasan bibe tevgerêk giştî û zemîna bo hemû hêzên xebatkar û welatparêz amade bike ku bikarin ligor stratejiya netewî, jî bo xurt kirina Rasanê, pitansiyela berxwedana Rojhelat bo rizgariyê li dor hev kom bikin, bi hêzên Rojhelat ra kete diyalog û hewldanek mezin û bi xweşî ve encam û berhema wan hevdi-

tinan bû sebebê tifaqa navbera 5 partiyên Rojhelat û karîn bi hevra “Navenda Hekariya Hêzên Rojhelatê Kurdistanê” ava bikin û bi hev ra ligor vê tifaqê û li gor rewş û kavdanên tîn pêş, li astên cur be cur yê siyasî, dîplomasî, cemawerî û..., ligor bernamê û pîrensîpên hevbeş bikaribin bo berjewendiya gel û welat xwedî biryar û helwestên hevpar bin. Li 2016 heta 2018, hevdem ligel vê xebata li Rojhelatê Kurdistanê, em dibînin hem li Îranê û hem jî li Rojhelata Navîn û di qada navdewletî da, jî gelek hêlan ve rewş hatiye guhertin û bandora wê guherînê wek pêvajoyek nû roj bi rojê zêdetir rêjîma Îranê ber bi rûxanê ve dibe. Li asta navxweyî de bi sedemên kirîzên siyasî, civakî, kultûrî û aborî, destpêkirina serhildanên xelkê nerazî jî vê rêjîmê, li piraniya wilayet û bajarên cuda cuda de ku hemû pêkhatiyên netewî û oliye Îranê bi diruşma rûxana vê rêjîmê bi rengên cuda cuda lidar dixin, detpêka piroseyek nû jî nemana baweriya gel bi vê rêjîmê û jidest dana meşrûiyeta vê rêjîmê ye û rêjîma Îranê jî nek her nikare wan kirîzan çareser bike, belkî bi sedema hebûna gendelî û sistema rantê, ew pîrsgirêk û qeyran roj bi roj zêdetir dibin û tevahiya bîngeh û sistema rêjîma Melayên Îranê ketiye nava lîrîzîn û leqbûna ber bi rûxanê.

Serbarî vê rewşa hundir, em dibînin li asta derve jî paşî hatina ser kar ya Serokê Amerîka Donald Trump û helweşandina rêkeftina nûklerî, ku li Îranê jê ra dibêjin

**Bi sedan xortên
şoreşger jî bo
rizgariya welat tîn
nav refên Hêza
Pêşmergeyê Kurd-
istanê û mil bi milê
xebata Pêşmergeyan,
gel jî li nav bajaran
xwe birêkxistin dîkin
û rewşê jî bo serhil-
dan û hereketên ner-
azîbûna cemawerî
pêk tînin**

(BERCAM), û jî nû Ve lidarxis-
tîna dorpêç û Ambargoyên aborî
li dijî Îranê û hewldanên jî bo pêşî
girtin û qutkirina destê Îranê li
tevlîheviyên li Sûriyê, Iraq û Ro-
jhelata Navîn, êdî ev rêjîm li asta
herêmî û navdewletî da jî ketiye
perawêz û inziwayê û meşrûiyeta
xwe ya navdewletî jî ji dest daye.
Bandora vê dorpêç û helwesta
Emerîka li dijî Îranê, jî hêla aborî
ve bûye sedemê bê qîmet
bûna buhayê diravê
Îranê û giranbûna sedî

Pêşmerge simbol û nirxa neteweyî



Dara Natiq

Di nava her gel û neteweyekê de, nifşek ji vê civakê weke sembola azadî û berxwedan û berevanîkirin ji maf û kerameta wî gelî tê naskirin û rêzeke taybet ji wan tê girtin û giraniya xwe hene.

Di nava neteweya Kurd de jî, pêşmerge weke sembola azadî û berxwedanê tê naskirin û bi cangorîtiya xwe û berevanîkirin ji maf û kerameta gelê xwe li hem-ber dagîrkerên kurdistanê weke mirovek azadîxwaz û bi îradeyek bilind a neteweyî, bûye yek ji nifşên bibandor û xwedîmoral di asta civatgeha kurdistanê de.

Pêşmerge ew mirovê welatparêz û xwdî îrade ye ku bi xebat û cangorîti û zanebûna xwe di pêxema azadî û serbestiya gelê xwe de xebatê dike û bûye çiqla nav çavê dujmin û dagîrkerên kurdistanê. Pêşmerge ew simbol û morala neteweyî ye ku hertim di çepera xebat û berxwedana neteweyî de, bi bilindragirtina ala xabatê cehda helandin û têkbirina siyasetên hovane û dijî mirovî yên dagîrkerên Kurdistanê dide. Ew simbol û samana netew-



eyî bo bidestveanîn û parastina nasnameya xwe ya neteweyî li hember dagîrkerên Kurdistanê de disekinin û di pêxema misogerkirina azadî û demokrasiyê de tim dixebitin.

Pêşmerge hêma û sembola gelekî bindest û zilmjêkirî ye. Pêşmerge bazê bilinde çiyayçên serkêşe Kurdistanê ye ku bo gehîştin bi armancên pîroz yên neteweya xwe bi tehemolkirina dijarî û astengiyên ser rêya xebatê, hertim berdewam e. Pêşmerge azadîxwazekî xwdî bîr û bawer e ku di nava dilê gelekî bindest de serî hildaye û di pêxema rizgariya gelê Kurd û herifîna kelha dîktatoriyê, heya dawî dilopa xwîna xwe û ber bi elenda serkevtinê ve gavan davêje û di pêvajoya xebat bo gehîştin bi azadî û demokrasiyê, li tev metodên xebata aştiyane mifahê werdigre. Bîr û bawerî, hêz, îrade û xweragiriya pêşmerge, ey-ankerê zindîbûna neteweya Kurd e û di hemen demê de jî, afirînerê hizaran şanazyên cur bi cur di dîroka rizgarîxwazî a netew-

eya kurd de ne. Çeka pêşmerge, baweriya pêşmerge, hêz û îradeya bilind a pêşmerge, moral û hêviya gelekî bindest û xwdî îrade ye. Pêşmerge şoreşvanekî azadîxwaz e ku bîdengiyê wekî bêhêzî û bêçareyiyê dizane, û amade ye ku canê xwe bixe tirsê, bona vê ku bîr û baweriya xwe zindî ragire. Ew kesek e ku amade ye di qada xebat û berxwedanê de tekoşinê bike, û nexweşî û zehmetiyan qebûl bike, lê tucarî bindestî û zelûliyê qebûl nake.

Pêşmerge wate qebûlnekirina hêlên sor ên dût ji eql û dîktatoriyê, wate rewşenbîrek e ku bi siloganên demokrasî ji bo azadî û serbilindiya neteweya xwe, çek û alaya xwe bilind ragirtiye û, mirina li ser pêyan baştir dizane ji serîtevandina di hemberî kevneperestiyê de. Destanrêsiyên pêşmerge îro rojê di cîhanê de deng vedaye, lewma ser û malê gelê me, îro pêşmerge ye. Ew azadîxwazekî şoreşvan e ku kariye serbilindane xwe û neteweya xwe biparêze.

Pêşmerge bi xebat û cangorîti û zanebûna xwe di pêxema azadî û serbestiya gelê xwe de xebatê dike û bûye çiqla nav çavê dujmin û dagîrkerên kurdistanê

Pêşmerge îrade û vîna herî bilind û nasnameya neteweyî ya gelê Kurd û sembola berxwedana azadîxwaziya gelê Kurd û sembola pênaseya Kurdbûna me ye. Ew sembola binirx a neteweyî, bi xebat û cangorîtiya dehan salî a xwe, hertim li hember dagîrkerên kurdistanê de sekinîne, û koşk û stûnên zordariyê û yek ji wan rejîma cinayetkar a komara îslamî xistine lerzê.

»»» Doma R:5

sed ya nirxa pêwîstiyên jiyanê bi giştî û xasmanî erzaqê xwearinê, bê îtbar bûna sîstema bankî û ji kar rawestana piraniya fabrîkeyên navxweyî, ji kontrol derketina rewşa bazarê, vekişîna kompaniyên biyanî û helweşîna piraniya girêbestên ticarî û bazirganî bi wan kompaniyan re, êdî rûxana yekcarî ya aboriya Îranê xistiye rojevê. Ev pirsgirêka di hêla aborî de bandor liser hemû aliyên jiyana xelkê daniye û êdî jiyana wan pîr zehmet bûye û bêkarî, buhatî û

nebûna îmkânên jiyanê bûne sedemê bêkar mayîn û birçî bûna bi milyonan xelkê Îranê.

Guman nîne ku penguhirîna wan hemû qeyran û pirsgirêkên dê li pêşerojê da bibe sedemê ji kontrol derketina îdarekirina civakê û ber bi teqîna yekcarkî û serhildana seranserî ya xelkê Îranê bo rûxandina vê rêjîmê û rizgarbûn ji wan hemû arîşeyên jiyanê.

Li rewşek wesa de em dibînin rêjîm herî zêde ji serhildana gel ditirse ta ku zext û fişarên Emerîka, ji be wê jî tê pêşbînîkirin ku rêjîm li pêşerojê de hewl bide jîngehek bi temamî leşkerî û tund liser welat de zal bike û di nav hêzên serbazî û rêvebirên xwe da jî dest bi tesviyekirinê bike da ku bi yekdest kirina hikûmetek bi rengê polisî û leşkerî, bikare pêşiya rûxana xwe bigrin.

Lê pirsgirêk meztir ji hindê ye rêjîm bikare wan pirsgirêkan bi zora çek çareser bike û bixwaze pêşiya wê her-ekata nerazîbûna xelkê bigire.

Bi berçav girtina van rastiyan em dibînin niha ji her wextekê zêdetir, hem di qada navxweyî de û hem jî di qada derve de tevgerêk nû ji bo nemana vê rêjîmê ketiye rojevê û béguman heta ev rêjîm li holê neyê rakirin, ne balans û istiqrara Rojhelata Navîn cêgîr dibe û ne jî xelkê Îranê bi hemû pêkhatiyên wekî Fars, Kurd, Belûç, Erebi, Turkmen, Azerî dê karibin di atmosferek aştiyane û wekhevî di wê coxrafîyayê de bihevra bişînin.

Nerîna Lîderan



Trump:

“Armanca Îranê têkdana ewlehî û jînavbirina Demokrasî di Îraqê de”.



Danford:

“Taliban di şerê Efxanstanê de, di hale şikestxwarinê de nînin”.



Melik Selman:

“Rejîma Îranê ji terorîzmê piştevanî dike, û bêserûberî û wêraniyê di herêmê de zêde dike”.



Aldar Xelîl:

“Senaryoya Efrînê di navçeyên din ên Rojava de ducarî nabe”.

Hêza yekgirtî dikare kelha dîktatoran biherifîne



Nûredîn Sofîzade

Haya hemî kesê lê heye ku roj bi rojê pitir deshelata rêjîma Îranê ber bi sernixûniyê ve diçe, lê pirsyar ev e ku çi bê kirin ku sernixûnî lezgîniyê bi xwe ve bibîne.

Niha givaşên navnetewî bo ser rêjîma Îranê, pitir ji hemî demên derbasbûyî rewşa siyasî û abûrî û di zaf waran de xistiye tengasiyê, bi taybetî bi hegera dorpêçên abûriye Amerîka bo ser Îranê, dest û pêyên rêjîmê heta qasekê şikandine, her eva jî bûye sedem ku givaş bikeve ser jiyan û qetandina xelkê Îranê jî.

Her bi hegera wan givaşan abûriya Îranê herifiye, giranî, bêkarî, nedarî, bûye sedem ku îsal pitir ji derbasbûyî em şahidê dengê nerizayeti û xwenîşandanên xelkê li dijî deshilata dîktator a Îranê bibin.

Herwî hemî aliyek agehdar in, qatên kirêkar, bazarî, jin, çalakên medenî, çalakên jîngehparêz, xwandekar, çalakên civakî û hwd... berdeham di nerizayetiye da bûne. Lê mixabin heta niha

jî dengê nerizayetiya wan qatên cuda-cuda, nekariye bibe yek dengê bihêz û seranserî. Hekî yek ji wan qatan dest bi nerizayetiye kiribe, tenê maye her wekî vê ku qata nerazî berî wan dibe bêhna xwe vede, dawî bi nerizayetiya xwe aniye.

Erê gelo sedem çî ye ku aliyên nerazî yên civaka Îranê nikarin bi yekdengî li dijî dîktatoriyê xwe rêk bêxin?

Bê guman ev nehemahengî û nebûna yekdengiyê dizivire ser du sedeman.

1-Nebûna sergêr û bernamedarêjiyeke hewce di navxwe ya welat da, ku bikare dengê xebat û nerizayetiya aliyên cuda bike yek. Di demekê de ku hemî xwenîşandan û mangirtin û nerizayetiyeke li dijî rêjîma dîktatore Îranê ye, lê mixabin her qateke nerazî û li halê xebata li dijî rêjîmê xwe berpirsyar nizane li hember daxwazên qateke dinêye cuda ji xwe, ku ev jî li halê nerizayetiye daye. 2-Nebûna hêz û altirnatîveke yekgirtî di nava opozîsyona dervey welat, ku em dikarin bêjin sedemêke dinê ya çênebûna yekdengî û hemahengiya xebata li dijî rêjîmê di navxwe ya welat daye.

Lewma bona bihêzbûna dengê xebata li dijî dîktatoriya axûndî û çêbûna yekîtiyeke bihêz ku bikare stûnên kelha zordariyê bêxe lîrêzê û di dawiyê de biherifîne, çêbûna yekîti û yekdengiya xebata li dijî rêjîmê jî di demekê de dibe rastî

û hasil dibe, ku hemî xelkê jêr stemê yên Îranê û qatên nerazî, ji maf û daxwaziyan hevdu xwedî derkevin û maf û daxwazên xwe bizanin. Di vê pêxemê da bû ku hevdem digel berfirehtirbûna dengê bêzariya ji rêjîmê di navxwe ya welat û givaşên derekî bo ser rêjîmê, hêzên siyasî ên Rojhilatê Kurdistanê, digel parek ji hêz û aliyên siyasî yên Îranê û netewên din yên Îranê bona hemahengî û çêkirina yekdengiyê bi meqseda piştgîriya dengê xebata navxwe ya xelkê, levtegihiştineke weke vexwandina hemî aliyekî bo xebata yekgirtî, îmze û belav kirin.

Ev pêngava hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê digel hêzên din, dikare heta qasekê di du waran de vê valatiyê tijî bike.

1-Ev yekîtiya dikare bibe altirnatîva encama serkevtina xebata xelkê Îranê û dikare di halê xebatê da jî bibe “merce’î” û hêlên xebatê bide navxwe ya welat û yekdengî û hevxebebiyeke bihêz di nava civaka Îranê de çê bike. 2-Ev yekîtiya hêzên siyasî ên opozîsyona rêjîmê, dikare weke muxatib û aliyê dîplomasî ya derve bê nasandin û bikare weke hêzeke yekgirtî bo xebata li dijî rêjîma Îranê hesab li ser bê kirin, û nûneratiya dengê serhildana hemî xelkê Îranê li ser bê kirin.

Herçiqas eva pêngaveke erênî ye, lê bona çêkirina yekîti û yekdengiya xebateke bihêz û xwedîbandor hêla jî kême û dibe pitir cehd bê kirin.

Xwekujiya jiyanê!



Eskender Ce'iferî

Di demên dawiyê de rêjeya xwekujiyê li Kurdistanê zêde bûye û li gora ku çalakvanên sivîl didin zanîn, rêjeya salane ya xwekujiyê li wir ne kêmtirî rêjeya salane ya darvekirinê ye. Piraniya wan kesên ku xwe dikujin jî, jin in. Ji berê ve jin weke jiyan tê dîtîn û bi rêjeya bilind a xwekujiya jinan jî em dikarin bêjin jiyan û mirovahî ji nav diçin. Xwekujî, kiryarek e ku mirov bixwe tê de biryarê dide dawiyê li jiyana xwe bîne. Mirov dikare bêje sedema sereke ya vê kiryarê li hemû civakan bêhêvîbûn e.

Xwekuj, ji her çandekê bi her zimanekî û ji her neteweyekê be, digihe astekê ku li gor wî/wê neman jê re bi mifahtir e ji jiyanê.

Li gora zanyariyên ji çalakvanên Kurd, piraniya wan xwekujîyan ji ber sedemên weke abûrî, tûşbûna bi madeyên hişber û ji ber pirsgerêkên malbatê ye. Eger kerameta mirovan ji hikûmetan re girîngtir be, divê kesekî sivîl neke bi hêsanî çek û sîlahan bi dest bixîne. Hebûna çek û sîlahan di civakekê de dikare fikra tundrew li pey xwe ve bîne. Eger salane 200 welatîyên Kurd ji aliyê wezaretê Dadê ya Komara Îslamî a Îranê ve tenê darvekirin, zêdetirî 500 kesên jî dawiyê li jiyana xwe tînin.

Hebûna hebên naskirî bi Birinc û Siyanor jî dikare rê li ber xwekujiyê veke. Ew kîjan dermangeh e ku li Îranê, bêtir biryara pizîşkan, heban nefuroşe! Salane 800 hezar kes heta milyonek kesên li hemû cîhanê bi şewazên curbicur dawiyê li jiyana xwe tînin. Rêkar û rênimûniyên ayînî, dema ku



tevlî siyasîyê dibin, fikra mirovan jî diguherin. Li gor ola Îbrahîm, jiyan tiştêk pîroz e lê xwekujî jî gelek mezmûm nîn e. Japonî jî xwekujiyê weke qerebûya pêşîneya xirab dibînin.

Li Hindistanê jî jina ku zilamê wê dimir, dikarî xwe bavêje ser agirê ku laşê zilamê pê dişewtînin da ku ew jî dawiyê li jiyana xwe bîne. Perwerdekirina zarokan li gor fikrên qedîm jî dikare sedemeke din a xwekujiyê be. Hin ji wan kesên ku bi vî rengî tene perwerdekirin, tevî girûpên tundrew dibin û xwe di berjewendiya wan de dikujin. Li Kurdistanê Îranê asta bilind a xwekujiya ji ber sedemên siyasî û abûrî, vî şewaza xwekujiyê vedişêre. Li gelek ji welatên Rojava, êdî xwekujîyan hewla xwekujiyê weke Tawan nayê hejmarkirin.

Lê belê divê ji bîr nekin ku hêviyên jiyana xelkê li welatên Rojava eger gelek jî baş nebe, lê hêjayî kerameta mirovan e. Li hin welatan şewazeke xwekujiyê bi navê Xwekujiya Alîkar heye. Hin çalakvan dibêjin hikûmeta Îranê jî bi kiryarên xwe ên abûrî û siyasî bûye alîkariya xwekujîya qurbanîyan dike. Êdî li hin welatan şewirmendên xwekujiyê jî hene ku hêsanîrîn rê ji bo xwekujiyê, nîşanî xelkê didin. Lê belê bi ti awayekî mirov nikare Îranê û Kurdistanê Îranê bi welatê Rojava re danî ber hev.

Wê demê nirxandina civakekê bi civakên din re çê dibe ku asta jiyana welatîyên wan jî weke hev be. Hin siyasîyên Îranê pêşniyar dikin ku termê wan kesên ku xwekujiyê dikin, di qebristanên gund û bajaran de neyên binaxkirin. Lê belê wan ji bîr kiriye ku divê çavkaniya xwekujiyê bê hişkkirin. Mentiqa wan kesên Atêna berê ya Yonane ye ku kesên bêtir erêkirina hikûmetê dawiyê li jiyana xwe tînin, ji binaxkirina di goristanan de dihatin bêtir kirin û bê navûnîşan li dervey goristanan dihatin binaxkirin. Dibe ku ew kiryar jî bikarin meyl û heza xelkê ji bo xwekujiyê kêmkirin.

Lê dîsa jî nabe hikûmet ewqasî xemsar be ku li dewsa zuhakirina çavkaniyê, qurbanîyan weke tawanbar bide nasandin yan jî piştî xwekujiyê, hikûmet dest danî ser milk û malên wî/wê. Desthilata ku herî zêde bi şeweyekê radikîl li hemberî vî mijarê derdiket, Berîtanya di sedsalên 19'an de bû. Eger li ser kesekî/ê bihata îsbatkirin ku hewla xwekujiyê daye, ew kes dihat darvekirin. Mentiqa desthilatdarên wê demê ên Berîtanya ji bo îdamkirina kesên ku dest davêjin xwekujiyê ew bû ku tirsek li cem xelkê çê be û li encama xwekujiyê bifikirin. Ji xeynî sedemên han, hin bûyerên din jî çê dibin. Çendîn caran heta niha li Kurdistanê Îranê bûyerên bi vî rengî derketine ku keçek ji aliyê

**Salane 800 hezar
kes heta milyo-
nek kesên li hemû
cîhanê bi şewazên
curbicur dawiyê li
jiyana xwe tînin.**

saziyên ewlehî ve tê girtin.

Tê gotin ku hêzên navbirî di girtîgehan de destdirêjiyê dikin ser wan keçan ku bi sedemên siyasî hatine girtin. Ji ber vê jî, hin keçên Kurd piştî ku serbest tene berdan, dawiyê li jiyana xwe tînin da ku navekî xirab nekeve ser wan. Hin siyasîyên nêzîkî Mihemedê Xatemi li Îranê behsa yasayîkirina xwekujiyê kiribûn. Lê berî ku bibe mijara ragihandinê, hate bêtir dervekirin.

Li gor wan kesên, diviyabû kesên ku dixwazin dawiyê li jiyana xwe bînin, sedemên baş ji bo vî biryarê bînin û endamên laşê xwe jî pêşkêş bikin.

Di heyama salekê de nirxa hewcehiyan %68 zêde bûye

Pêka rapora Banka Navendiya Îranê nirxa hewcehiyên rojaneye xelkê gihîştîye %68.

Di meha Gelarêzana 1397-an da Banka Navendiya Îranê li derheq giranî û zêde bûna nirxa hewcehiyên rojaneye xelkê, raporek belev kir.

Banka Navendî ragehand ku li çav sala 1396-an navgîna giraniyê pêka sala derbasbûyî, %68 zêde bûye.

Dorpêçên Amerîka li ser Îranê bandoreke mezin kiriye ser bazar û jiyana xelkê.

Di rapora Banka Navendiya Îranê da, wek mînak amaje bi nirxa çend qelem ji hewcehiyan hatiye kirin, weke:

Berhemên Şîr (Lebeniyat) %57

Hêke %57

Birinc %22

Peledahn %15

Êmîş %69

Sebzî û pincar %40

Goştê sor %39

Mirîşk %49

Ça %24

Rûnê nebatî %44

Qend û Şekir %42



Di Îranê de ciwanekî 20 salî li ber rewşa xirab ya aborî, li ber deriyê Wezareta Kar xwe şewitand

Ebas Kerîmî fermanî Yekîneya Parastina Fîzîkî ya Emakina Polîsê Pêşgîriyê ji Teheranê nûçeya xweşewitandina ciwanekî 20 salî li pêşberî avahiya Wezareta Kar piştrast kir.

Wî ragehand: Demjimêr 9`ê Sibezû bû ku hevalên me dîtin ku ciwanekî 20 salî bi tirombêla Tîba ya spî di kiryareke çaverênkirî de benzîn bi ser xwe de dakir, û agir berda xwe. Piştî ew bilez bo nexweşxaneyê hate veguhastin. Karnas û çavedêr radigehînin ku

sedema serekî ya xwekujiyê di nava xelkê û bi taybetî gencan û kesên ku taze zewicî ne de, zêdetir destengî û zextên civakî, bi sedema nebûna azadiyên destpêkî ne.

Di meha derbasbûyî de heya niha aliyê kê 11 hevwelatîyan xwe kuştine. Ew kesane pênc jin, nûciwanek, sê kes di şaristanên Serdeşt, Pîranşar, Merîwan, Bane, Riwanser, Bendera Turkemen, û Kirmaşanê de bûn. Sedema serekî ya xwekujîya wan kesan jî destengî, kêşeyên aborî, û kêşe û netebahiyên di nav malbatê de bûye.



Sinetkirina jinan di hin deverên Îranê de berdewam dike

Heya niha jî, sinetkirina keçkan li gorî edetên berê, di hin parêzgehên Îranê de berdewam dike.

Kamil Ehmedî, lêkolerê mijarên çandî û xelknasiyê, daye xuyakirin ku, sinetkirina jinan di Îranê de, ber bi kêmbûnê ve diçe, lê %50 ji keçkên li deverên parêzgeha Homozganê heya niha jî, pêka edetên berê tînin sinetkirin, û herwisa ev mijara di hin deverên Îranê de, berdewam dike.

Lêkolîna ku, “Kamil Ehmedî” lêkolerê mijarên çandî û xelknasî, li sala 1384`an heya sala 1394`an encam daye, berfirehbûna mijara sinetkirina jinan, di çar parêzgehên Îranê yên wekî, Hormozigan, Kirmaşan, Kurdistan û Azerbay-



cana Rojava de nîşand dide. Wî lêkolerî derheq mijara han de, pirtûka bi navê “Sinet” (Edet) nivîsiye, û heriwsa navbirî li ser vê baweriyê ye ku, di deverên ku çalakvanên mafê jinan tu çalakî nebûne, lê bi sedema guherînkariya dîtingeha nîfşa ci-



wan ya derheq sinetkirina jinan de, û çûna gundiyan bo bajaran û mirina jinên ku karê sinetkirina keçkan encamp didan, bûye sedem da ku, amara sinetkirina jinan di Îranê de kêmbibe.

Her di vê pêwendiyê de jî, wî lêkolerî daye zelalkirin ku, mijara han pêwendîya rasterast digel azardana keçkên zarok de heye, û herwisa gotiye ku, sinetkirina keçkan di gundan de zêdetir e, û ev jî bi sebeba lawazbûna aborî û çandî di van deveran de ye.

Beşdariya Nûnerayetiya Hizba Demokrat di pirseya “Meryem Qazî” de

Heyeteke Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê li bajarê Hewlêrê, beşdarî di pirseya “Meryem Qazî” de kir.

Roja Sêşemî rêkefta 22-ê Xezelwera 1397’an a Zayînî, heyetekî nûnerayetiya Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê, bi serperestiya “Mihemedsalih Qadirî” Nûnerê Hizba Demokrat li bajarê Hewlêrê, beşdarî di pirseya xatû “Meryem Qazî” de kir. Xatû “Meryem” kesayetiyeke naskirî ya malbata Qazî, û nûser û çalakvan di warê civak, edebdost û çîroknivîs, li Rojhelata Kurdistanê bû.

Ev pirseya li baregeha Yekîtiya Nûserên Kurd li bajarê Hewlêrê, bi beşdariya nûser, û kesayetiyeke ekadîmî, nîştimanperwer û endamên malbata Qazî bi rê ve çû.

Di wî pirseyê de “Mihemedsalih Qadirî” nûnerê Hizba Demokrat li bajarê Hewlêrê bi wê boneyê ve sersaxî û hevxiyariya Hizba Demokrat û “Mistefa Hicrî” lêpirsiyarê giştî yê Hizba Demokrat bi malbata xwedêjêrazî “Meryem Qazî” gehand, û ji aliyê kesûkar û malbata navbirî ve pêşwazî ji wan hate kirin.

Pirtûka bi navê “Peydakirina Kurdistanê” hate çap û belavkirin



Pirtûka bi navê “Peydakirina Kurdistanê” (Finding Kurdistan), ku “Hewrê Hedadî” nivîsiye, hate çap û belavkirin.

Pirtûka “Finding Kurdistan”, li sala 2018’an li Amerîkayê hate çap û belavkirin.

Nivîserê vê pirtûkê piştî heyama çend salan hewl û mandîbûnê, ezmûn û dîtingeha xwe ya derheq Kurdistanê û bi taybet Kurdistanê Rojhilat, di 212 rûpelî de, bi zimanê îngilîzî bo hevvelatiyên Amerîka û hemû welatên îngilîzîziman bas kiriye.

Ev pirtûka ji du beşên cuda pêk hatiye, wekî: Kurd kê ne û di çi welatan de jiyan dikin, kultur û çand a wan çi ye? Herwisa ev welatane bi çi awayî digel wan reftarê dikin?

Beşa duyem jî, wekî ku Kurd dibêje: “Min çi dîtiye û çi nedîtiye, ya nivîserê pirtûkê ye, ku serdana hejmarek bajarên Kurdistanê Rojhilat yê wekî, Bikan, Me-

habad, Serdeşt û Bane kiriye, û wekî serfernameyekê bas ji rewşa Îranê û bi taybet Kurdistan kiriye, ku di çi rewşeke xirab de jiyan dikin, û herwisa nivîser îşare bi arîşeyên jinan û rewşa derbaziya jinan û nebûna edaletê kiriye ku bi ser wan de sepandine.

Herwisa di beşeke din a vê pirtûkê de nivîser bas ji ezmûnên xwe dike ku, di bajarê Bikanê de xwe û malbata wî ji aliyê îtila’atê ve bi tawana sîxorîkirin bo Amerîkayê hatibûne destbiserkirin, û dihatne azar û îşkencekirin.

Bi awayê giştî merema wî nivîserî, ji belavkirina vê pirtûkê, nasandina gelê Kurd ji xelkê Amerîkayê re ye, ku gelê Kurd ji hemû maf û azadiyekê bêpar in.

“Hewrê Hedadî”, bawerînameya masteriyê ji zanîngeha “Boston”ê wergirtiye, li sala 1995’an, li çiyayên li ser sînorên di navbera sînorê Kurdistanê Rojhilat û Kurdistanê Başûr, ji dayîk bûye, û dê û bavê navbirî bi sedema endambûn û tevlibûna di nav refên pêşmergeyên Partiya Demokrat de, bi neçarî li sala 1997’an, bo Amerîkayê koçber bûne.

Nivîser û wergêrekî Kurd koça dawiyê kir

Hekîm Kakeweys nivîser û wergêrekî navdarê Kurd, piştî temeneke zor xizmetkirin bi ferheng û edebiyata Kurdî bo heta-heta xatirê xwe ji cîhana edebiyatê xwast.

Roja Yekşemî rêkefta 27-ê Xezelwera 1397’an, “Hekîm Kakeweys” nivîser û wergêrê navdarê Kurd, piştî temenekê xizmetkirin bi pirtûkxane û edebiyata Kurdî li bajarê Bexda koça dawiyê kir.

“Hekîm Kakeweys” di warê wegeranê de gelek şîyan hebû û di dema temenê xwe de çend pirtûk nivîsiye û çend pirtûkên din jî wergerandine ser zimanê Kurdî.

Ev nivîser û wergêrê Kurd pişkeke berçav ji berhemên nivîser û bîrmendê Kurd “Mesûd Mihemed” ji zimanê Erebi ve wergerandine ser zimanê Kurdî. Navbirî çendîn pirtûk jî ji zimanên Erebi û Swîdî ve wergerandine ser zimanê Kurdî.



“Hekîm Kakeweys” sala 1949’an li gundê “Hesarî Gewre” li Kerkûkê ji dayîk bûye, û qonaxa xwendinê ya amadeyî li Kerkûkê tewaw kir, û sala 1973’an beşa bîrkarî, li kolêja zanistî li zankoya Silêmanî tewaw kir, piştî tewawkirina zankoyê heya dawiya Şorişa Eylûlê Pêşmerge bû.

Li sala 1984’an li welatê Siwîdê akincî bû, sala 2000’î bi sedema nexweşiya dil xanenişîn bû, û piştî zivîrîna bo warê xwe li gundê “Hesar” li Kerkûkê, jiyana xwe bi xwendin û nivîsîn û wergêranê ve bi ser bir.

Zimanê Kurdî

- Bila ez biketama, tu biketayiya
(biketaya) ew biketaya, em biketana, hûn
biketana, ew biketana.
HTD.....

3-Bi karên derhingêv (têper) re:

Cînavên koma (ez) bi karên derhingêv re

(di dema bûrî de) dibin berkarên rasteder :

- Zîne ez dîtîm, Zîne hûn dîtî....
- Zîne tu dîtîye, Zîne em dîtîne...
- Zîne ew didît, Zîne tu didîtî...
- Zîne em û hûn û ew dîtîbûn.

- Dema nuho : (nivîsîn).

- Ez nameyê dinivîsim, tu nameyê
dinivîsî, ew nameyê dinivîse,
- Em nameyê dinivîsin, hûn nameyê
dinivîsin, ew nameyê dinivîsin

- Dema paşeroj :

- Ez ê nameyê binivîsim, tu yê nameyê
binivîsî, ew ê nameyê binivîse, em ê nameyê
binivîsin, hûn ê nameyê binivîsin, ew ê
nameyê binivîsin.

- Raweya fermanî :

- Nameyê binivîse (tu)
- Nameyê binivîsin (hûn).

- Raweyên dazxwazî :

- Xwezî ez nameyê binivîsim, tu nameyê
binivîsî, ew nameyê binivîse, em nameyê
binivîsin, hûn nameyê binivîsin, ew nameyê
binivîsin.

- Gerek ez nameyê binivîsim, tu nameyê
binivîsî, ew nameyê binivîse, em nameyê
binivîsin, hûn nameyê binivîsin, ew nameyê
binivîsin.

4- Bi nav û karê (bûn)ê re :

- Ez kurd im, tu kurd î, ew kurd e, em kurd
in, hûn kurd in, ew kurd in.

Heger nav bi tîpeke dengdêr kuta bûbe, Ev kurtebêje (im, î, e, in)
dibin (me, yî, ye, ne):

- Ez zana me, tu zana yî, ew zana
ye, em zana ne, hûn zana ne, ew
zana ne.

5- Bi hevalnav û karê (bûn) ê re :

- Ez dirêj im, tu dirêj î, ew dirêj e, em dirêj in,
hûn dirêj in, ew dirêj in .

6- Bi hevalkar (zerf) û karê (bûn)ê re :

- Ez dûr im, tu dûr î, ew dûr e, em dûr in, hûn
dûr in, ew dûr in.
- Ez li ser darê me
- Tu li kû yî ?
- Ew li ber avê ye
- Em, hûn, ew li quntara çiyê ne.

Hinekan ji şarezayên zimanê kurdî, cînavên koma (ez) bi navê
“cînavên awayê karayî” (kirarî – fa’îlî) dane nasîn û yên koma (min)
bi navê “cînavên awayê palvedan û berkarî” dane nasîn. Bi dîtina
min ev danasîn, bi vî rengî, ne cîgirtî ye. Ji ber ku cînavên koma (ez),
di rêxistina hevokan de, kara tên û berkar jî tên : Kara :

- Ez te dibînim.
- Hûn min dibînin.

.....

(Berkar) :

- Te ez dîtîm.
- Min hûn dîtî

.....

Cînavên koma (min) jî, di hevokan de dibin kara û berkar: (kara) :

- Min tu dîtî
- Te Mizgîn dît

(berkar):

- Ew te dibîne
- Hûn wan dibînin
- Tu ji min re dibêjî (Dom heye)

Bi sedema hişkbûna gola Urmîyê canê 5 milyon kesan dikeve ber tirsê

Serokê Saziya Parêzvanî ji Jîngê ya Îranê ragehand, bi sedema hişkbûna gola Urmîyê, aliyê kêr canê 5 milyon kesan dikeve ber tirsê.

Îsa Kelanterî got: Min sala derbasbûyî jî li derheq encamên nerêniye hişkbûna gola Urmîyê hişdarî dabû û min basê gef û tirsê ve bo ser jîngehê kiribû, ku heger ev gola hişk be, canê pitir ji 5 milyon kesên akinciyê devrûberê Urmîyê dikeve ber tirsê micid.

Navbirî herwiha got ku çaxê xwe min egera ve tirsê micid dabû dewletê, lê mixabin çi cehdek bona berahîgirtina ji hişkbûna gola Urmîyê nehate kirin.

Her di vê derheqêda Ferhad Serxosê serokê Navenda Vejandina Gola Urmîyê ji got: Di gel hişkbûna gola Urmîyê, wê pitir ji 15 milyon kesên akinciyê devrûberê ve golê, dê neçarî barkirin û koçberiyê bin bo cihên din.

Ferhad serxos got: Piştî hişkbûna ve golê, mixabin toza xwê bi sedema ba û bahozan wê deverê de belav be, û dê bibe sedema hişkbûna hemî şînkafî û hasil û çandiniyê, û vê demê ye ku wê nexweşî belav bibe û akincî neçar bin dewerê bicî bihêlin û koçber bin.



%60 ji şirketên anîna tirombêlan hatine daxistin



Heya niha 6 hezar kesên ku tirombêl dianîne Îranê, bêkar mane, û %60 ji kompaniyên jî hatine daxistin.

Mêhdî Dadfer berpirsê Civata Anînejor ya Tirombêlan ragehad ku heya niha bernamerêjiyeke wisa me tune, derheq tirombêlan. Niha ku tirombêlên navxweyî giran bûne, ew

ketine hizra anînejor ya tirombêlan.

Li gora gotina navbirî niha ew kompaniyên ku mane jî, rewşa wan nebaş e, û tenê %30 ji çalakîyên xwe yê berê encam didin, û heke her weha em herin pêş, heya sala bê, tu kompaniyek namîne ku tirombêlan ji welatê din bikire û bîne navxweyî welat.

Mêhdî Dadfer berpirsê Civata Anînejor ya Tirombêlan herweha tevî îşarekirina bi girêdayîbûna kompaniyên tirombêlsaziyê rû li dewletê ragehand: “Heya wê demê ku dewlet destê xwe bixe nav vê mijarê de, û nûnerekî meclîsê yan kesekî ser bi dewletê, berpirsê van kompaniyên be, tiştê bi navê kerta taybet (xîsûsîsazî) di Îranê de em nabînin”. Wî derheq girîngiya dewletînebûna kompaniyên kirîn û firotina tirombêlan herweha îşare bi vê kir ku: “Tenê dewletînebûn û şexsîbûna kompaniyên dikare rikeberiyê di navbera firoşyaran de pêk bîne, û ew yek dibe sedema baştirbûna koalîteya (çawaniya) tirombêlan û xelkê ve neçar bibin ku rû bikin kirîna tirombêlên ku berhema navxweyî ne”.

Wî Wezareta Pîşesaziyê jî bi tundî rexne kir, û ragehand ku serbarê ve ku eva 15 sal in ku me şiyana ve heye ku li ser dewletînebûna kompaniyên xwe kar bikin, lê her carê wezîrekê kêmkarî kiriye, û em pare mane.

Xusro Kurdpûr sansorkirina nûçeyên bînpêkirina mafê mirovan di Kurdistanê de rexne kir

Xusro Kurdpûr, berpirsê Ajansa Nûçegihaniya “Mukriyan”ê, derheq sansorkirina nûçeyên derheq mafê mirovan di Kurdistanê de, ku ji aliyê hin medyayan de tîncam dan, bertek nîşan da.

Wî rojnamevanê Kurd, derheq nîşandana berteka li hemberî sansorkirina nûçeyên bidarvekirina hevvelatîyên Kurd

û gullereşandina rasterast ya bo ser kolberên Kurd de, ji aliyê hin medyayan ve navxweyî û yê derve de wiha nivîsiye: “Di pêşerojê de raya giştî wê şahîdiyê bide, û dirok jî wê dadweriyê bike ku, berê rojnamevanan nûçeyên îdamkirina hevvelatîyên Kurd, û kuştina kolberên Kurd sansor dikirin”. Roja Yekşemî 17ê Be-franbara sala 1396’an, Xusro Kurdpûr, berpirsê

Ajansa Nûçegihaniya “Mukriyan”, bo îdareya îtila’ata bajarê Mehabadê hatibû gazîkirin, û sedema gazîkirina wî çalakvanê mafê mirov jî, rûmalkirina nûçeyên derheq mafê mirovan de, hatiye ragehandin. “Xusrow Kurdpûr” û birayê wî yê bi navê “Mes’ûd Kurdpûr” ji çalakvanên naskirî yê di warê medyayê serbixwe, di Kurdistanê de ne. Ew du bira di Adara sala 2013’an, bi tawana



“pêkanîna civîn û têkdan û teblîx li dijî nizamê” ji aliyê hêzên îtila’atê ve hatibûnibûn destbiserkirin, û dadgeha Şoreş ya bajarê Mehabadê jî, her yek ji van bi 5 sal heps û dor xistina bo girtîgeha bajarê Tevrêzê û herwisa sê sal hepsa bi zorê ceza dabûn. Ev du bira bi derbazkirina heyama cezaya hepsa xwe hatine azadkirin.